# MÊR MÊRA NASDIKE!



JN Weşanên Jîna Nû

MaMoste 92

ISBN= 91-630-1231-6

# MÊR MÊRA NASDIKE!

## MAMOSTE

JN Weşanên Jîna Nû
ISBN. 91-630-1231-6

MAMOSTE: MÊR MÊRA NASDIKE!

Weşanxana Jîna Nû
BOX 30, 740 22 BÄLLINGE-SWEDEN
MAMOSTE 1993
ÇAPA YEKEM, 1993
ÇAP: APEC, STOCKHOLM 1993

# Pêşgotin

Gava meriv li ser rola karîkaturan a di jiyana miletekî bindest û ji mafên xwe bêpar bifikire, meriv dibêje qey piştî ku ev milet ji gelek awayên xweîfadekirinê bêpar e, divê karîkatur di jiyana kulturî ya vî miletî de gelek bi pêş ketibe. Karîkatur, hunerek e ku her çendîn, nîşanên karektera milî di xwe de vedinişîne jî di esasî de xwedan nîşanên navnetewî ye. Ne wek edebiyata nivîskî ye ku meriv bêje gava zimanê miletî qedexe be edebiyata wî, di zîndaneka tarî de ye, ji rohnahî û serbestiya pêşveçûn û kemilînê bêpar e.

Tirkiye, ku heta îro welatek bûye ku ji azadî û îmkanên xweîfadekirina ferdan û tebeqên civakê pire caran bêpar maye, civak ne civakek gihaştî û rûniştî bûye, civat bi bûyer, rûdan û têkiliyên nenormal dagirtî bûye, hunerê karîkaturan (çi mîzahî û ne mîzahî be) roleka berbiçav leyistiye. Meriv dikare bêje ku karîkaturî li Tirkiyê hunermendiyeke pêşketî û berfireh e jî. Têkiliyeka wê ya xurt bi civakê re heye. Bi kêmasî, heta nuha wiha çûye.

Lê tevî ku Kurd miletekî xwedan panzdeh milyon nifûs e di nav civaka Tirkiyê de, meriv nikare bêje ku ciyekî diyar ê karîkatura Kurdî di nav vê hunera karîkaturan de heye. Heta, her çendê gelek karîkaturîstên kurdnîjad ê binav û deng di nav vê hunermendiyê de hene jî, meriv nikare bêje ku "karîkatura Kurdî" heye.

Helbet, hunerê karîkaturan, gelek caran cîh dane Kurdan, Kurdistanê û pirs û êşên civaka Kurdewarîyê, lê ne bi nav û navnîşan û huwîyeta wan a eslîn. Li ber çavên Karîkaturîstan Kurdistan "Rojhilata Tirkiyê ya paşdemayî ya çiyayîn a bê rê û dirb a ji medeniyetê bêpar û ji dinya medenî vederbûyî" bûye. "Kurd" li ber çavên wan, "ew gundiyê rojhilati yê, nezanê paşdemayî bûye ku xulamê axa, şêx û serokeşîran bûye, Tirkî nizanîbûye loma jî ji nîmetên dinyayê bêpar maye, di riya axayên xwe re bûye depoya rayên hilbijartinan û h.w.d."

Dîtina çavên karîkaturîstî ya bi awakî wiha ne ku tenê dîtineka Tirkbînî ya kolonyalîst bûye her weha hemû xet û xalên nezariyên Kemalîzmê jî tê de diyar in.

Sedemê vê yekê ew e ku, berî her tiştî miletê Kurd wek hemû dezgehên miletbûnê yên din, ji dezgehên çapemenî û kulturê jî hatiye bêparhiştin. Rojname, kovar û dezgehên çapbûn û belavbûna van organan, yên Tirk bûn xizmeta Tirkîtiyê dikirin, berhemên edebiyat û hunera Tirk bûn. Jiyana kulturî, rewşenbîrî û fikrî jî di bin îpoteka îdeolojiya resmî de maf û îmkanên jiyanê ji bo xwe didît. Heke berdevkiya mejiyê Kemalîstiyê nekiraya nedişiya bijî.

Hunerê Karîkaturiya Tirk jî di nav vê rewşê de bi îdeolojiya nijadperest a kolonyalîst berbi pirsa Kurdî diçû. Hunermendiya karîkaturiya Kurdî jî ji ber bêdezgehî ya miletê Kurd peyda nebû.

Piştî salên şêstî bi peydabûna hin kovar û rojnamên Kurdî yan xwedankurd, tek û tûk Karîkaturên Kurdî yên bi çavê Kurdîtiyê hatibûn çêkirin peyda bûn. Car bi caran jî hin karîkaturîstên Kurdnîjad yan yên Tirkên demokrat firsend dîtin karîkaturên ne di bin tesîra kemalîzmê de di rûpelên rojname û kovarên Tirkan de derêxin. Lê ev nimûne bi hejmarên xwe gelek kêm bûn, îstîsna bûn.

A Mamoste karîkaturîstekî Kurd ê wiha ye ku di rewşeka dijwar a bêdezgeh û bêîmkaniya miletê Kurd de, piştî salên heftêyî bi huwîyeta xwe ya Kurdîtiyê derketiye, qelem û firça xwe ji bo daw û doz û êşa gelê Kurd livandiye. Wek lawekî miletê Kurd, di riya karîkatur û risim de xebat ji bo mafên siyasî û kulturî yên miletê xwe kiriye. Hejmara karîkaturîst û resamên ku bi navê xwe yê milî rabûbûn Li Kurdistana Tirkiyê qasî hejmarên pêçîkên destekî yan hene yan nînin. A Mamoste yek ji wan û belkî jî yê herî pêşîn ê wan e. Gava meriv li berhemên wan binêre, dibe ku ne gelek zêde bin û ne gelek pêşketî jî bin. Lê heke meriv rûmeta van berheman di rewşa bêîmkanî, bêdezgehî û zordariya li ser kultura Kurdî de raberî çav bike wê gavê hêjayiya van berheman çêtir diyar dibe. Ew destpêker û rêvekirê risim û karîkatura Kurdî ne, bi vê maneyê jî xwediyê cihekî hêja ne.

Ev berhevoka duduyan a Mamoste ye. Kitêba wî ya din jî ji ber zilm û qedexetî û bêîmkaniyetê li dervayî welêt çap bûbû, lê xwendevanên Kurd bi dilekî vekirî û kêfxweşî pêşwazî li vê pirtûkê kiribûn. Baweriya min ew e ku xwendevan wê gelek ji vê kitêbê jî hez bikin. Çimkî hem bi hunerê xwe hem jî bi naveroka xwe ji ya pêşîn ne kêmtir lê pêşdetir e. Ev kitêb her wiha nîşana pêşveçûna hunermendiya Mamoste ye jî. Seeta wî xweş. Bi hêviya ku di demên nêzîk de hunera karîkaturî jî wek buhara welatê me li her derê gul vede, geş bibe.

**Mûrad Ciwan**

**22'ê Nîsana 1993'an**




HILBIJARTIN
HESIN
ŞEKIR
180
160
140
120
100
80
60
40
20
0
1981
1982
1983
1984
1985
1986
AXX, AXXX
KU MIN KARIBÛNA
LI REYA JÎ WEK
TIŞTÊN DIN ZAM
BIKIRANA, EW DEM
KESÎ NIKARIBÛ
PIŞTA MIN BÎNE
'ERDÊ.




BIRA NAVÊ WÎ ÇIYA BE !..
BIRA NEWAL BE !..
BIRA ZINAR BE !..
NA WÊ NAVÊ WÎ KENDAL BE !..
NA WÊ KORTAL BE !..
NA WÊ DIYAR BE !..
MaMoste


ISTAINBUL UNIVERSITESI
MaTToste


ZEWACA BI NAME
BAVO MIN JI TE RE NIVÎSÎ BU KU, JI MIN RE QÎZA HECÎ ŞAKIRÊ XATÊ BIXWAZE, LÊ TE ÇÛYE QÎZA HECÎ ŞAKIRÊ XACO XWESTIYE Û JI MIN RE ŞANDIYE



1985.10.25
FOKLOR
HELBEST
AXAFTIN
OZANÊ KURD
SIVAN
KOMELA KURDÎ
AXAFTIN FOLKLOR
Û
ŞIVAN - GULISTAN
KURDISTAN
FOKLOR
AXAFTIN
HELBEST
28.10.1985
DANS

POLITÎKA BIYANIYAN A SWÊD
PIŞTÎ HILBIJARTINA 1985




Palme: Neyên vira heval!..






PARTIYA HERTÊŞTI ZAN
XELQÊ ME WER CEM ME.
ÇIMA EW NAÇIN BA HEV?
PARTI KOM U QAHRAMAN!

NAM Û DENGÊ "TIRK KEBABÎ"
DI EWRUPAYÊ RE DERKET!..




ŞERÊ DI NAVBERA ÎRAN Û IRAQÊ DE
KET SALA ŞEŞAN Û HÊ DOM DIKE.


ES KER


MERIV NIZAM BIGRÎ AN BIKENE LI HEMBER VÊ ŞOVENÎZMÊ?
KURD ÇÎ YE? KÎ NEBÊJE EZ TIRK IM HEQÊ WÎ Ê JÎYANÊ LI VÎ WELATÎ TUNEYE. HER BIJÎ TIRK!.
HER BIJÎ GELÊ ALMAN! HADÊ JI VIR SIKTIR BIN, TIRK ÊN BARBAR!...



# OLOF PALME HAT QETL KIRIN




SVENSK AB.
MELANÖSTERN
SVERIGE

LI SWÊD MAMOSTEYÊN DERSA KURDÎ DI HINEK DIBISTANAN DE BI TIRKÎ DERSÊ DIDIN ŞAGIRTÊN XWE




JI BASINÊ
EVREN: EZ TIRKÎYEK BÊDENG JI TIRKÎYEK BIDENG TERCIHTIR DIKIM.
Mamoste


ÇIL ÇÛK Û ÇIL MAÇÛK...
ÇIL MAÇÛK ÇÛ, MA
ÇIL ÇÛK.
x.y.719√z.y :6+
√ur- B. 697.123.x
521473.:x+
MaMoste


MAŞELLAHHH BERANÊ MIN ÇIQAS JÎR BÛYE...
MaMoSe




MIN DÍT!...
MIN DÍT!...


FLYKTING 86

JI BASINÊ: CUNTA NAVÊ BELEDA DÜGEHIRÎNE...



LI KURDISTANÊ "ARAME" DOM DIKE






XUŞKA MIN WEXTÊ TEYÎ ZEWACÊ YE. MA TU ÇIMA JI XWERE NA ZEWICÎ?
HETA KURDÎSSSTAN AZAD OLMASA, ZEWAC BANA HERAM E. MIN SOZ VERMÎŞ KIRIYE.


ÎŞKENCE TUNE YE...
KÎ DIBÊJE HEYE
XWE JI XWEDÊ DIKE...
BBC


ASKERÊN TIRK DI
SOL BOYAXKIRINÊ DE
NÎŞANA YEKEMÎN
STEND...
Akhisar'daki NATO manevralarında, Mehmetçik, Amerikan askerinin ayakkabısını boyuyor. Boya, Türk askere 10, yabancı askere ise 175 lira (25 sent). Mehmetçik ülkeye döviz kazandırıyor!
(SABAH'tan)
1
2
3


EV SERĒ SALEKĒ BŪ, MIN HER ROJĒ XWEDĒ JI DERGÎSTÎYA XWE RE NAME DIŞAND....
ÇI XÊR, ÇI HAL, DAWÎYA DAWÎ BI POSTECÎYÊ NAMÊN MIN BIRRE REVÎYA---
ÊÊÊ ÎNŞELLAH DAWÎ BI XER HAT!




MEKTEB-ÛL CUMHURİYE


?
LI MIN PEPÛKÊ!
EV JÎ HEBÛ...
EZ KARIM TUWALETA WE DEYN BIKIM?






TU ŞAŞÎ!.. BÊJE FIRLOT
FIRLOT BERXIKÊ MIN, FIRRRLOT

DI KÛLEKÊ RE: XEYALÎ NWÊ NÛSEREKANMAN



JI ROJNAMEYAN:
CÛNTA FAŞÎST LI HEMBER KURDAN
LI RIYÊ NÛ DIGERE




KU TU CAREKE DIN LI DU JINA MIN BIGERÎ, TU JI CEZAYÊ MIN XELAS NABÎ... EZÊ WÊ TESLÎMÊ TE BIKIM!..
Mamoste 90




QERAR


XEWLÎYÊ BIDE MIN!...
TE DÎSA AVÊ BAŞ
GERM NEKIRÎYE!
MaMoste




JI ROJA PÎROZKIRINA DIRAN DERKETINÊ




« YEKÎ SERBIXWEYÊ KU DI HEMÛ HIZBAN RE DERBASBÛYE »



MY KURDISH FRIENDS I WANT TO SAY....
TERCUME
MINA KURDISKA VÄNNER. JAG VILL SÄGA
HEVALÊN HÊJA ÊN KURD EZ DIXWAZIM BÊJIM KU....
TERCUMEYÎ TERCUMAN
KAKACAN BÎRADEREKANÎ KURDEKAN ÊME MEJULEKANÎ,KU....
ANLAMIYORUM, BE KARDEŞİM ŞU TERCUMEYİ TÜRKÇE YAPSANIZA!
? ?!
GUHDAR
TEMSÎLCÎYÊN PARTÎ Û HIZBÊN ME KURDAN


HELP
THE
RUSSIAN
-KURDISH REFUGEE-
KU EM HINEK PERE
BIDIN SOVYET, WÊ
GORBAÇOV DAXWAZA
ME KURDA VETO NEKE!.
HELP
MaMoSte




TÎYARA BULGARISTAN ROJEK BI DERENGÎ HAT.




LI STOCKHOLM JINKÊN KU EREBA ZAROKAN
BI WAN RE BE, BELAŞ LI OTOBÛSÊ SWARDIBIN






«Komela Mafên Mirovî»


ÇI ELEŞTIRÎYEK MEZIN DI KOVARÊ DE NIVISÎYE!
JI DÊVÊLA "SAYIN FLANKES" BI ZANEBÛN "BAY FLANKES" NIVISÎYE... WÎ MAHF KIRÎYE MAHF!
ÇI NIVISÎYE?
MaMoste



KURDÊN IRAQÊ JIBO OTONOMIYÊ
BI HUKUMETA IRAQÊ RE CIVÎYA.


MaMoSte 91


BIJÎ Û BIBÎNE,
EWLADÊ MIN...
BIJÎ Û BIBÎNE..
DOXTOR BEG, YEKÎ
BÊ MEJÎ, GELO KARE
ÇIQAS WEXT BIJÎ?
MatKosta


TU ÇIMA MÊRÊ XWE BERDIDÎ, EZ TÊ NAGIHÎJIM?
EZ JI MÊRÊ KU JINA WÎ DI BIN XELKÊ DE RAZÊ, PIRR ACIZ IM. JIBO VÊ YEKÊ EZ LI BALÊ NAMÎNIM.


M
SAP
VAL ÅR 1991
HILBIJARTIN LI SWÊDÊ


BABA, DUNYA ÇAWA KARE LI DORA XWE BIZIVRE ?
WAY ZINDÎQ TE DÎSA JI ARAQA MIN T'AM KIRÎYE HE...


MARKSISTÊN ME
Û
DERSA ŞOREŞGERÎ
SEMÎNER:
DI ÎLKEL-KOMUNAL TOPLUMÊ DE MATEMATÎK

# NIMÊJA ÎNÊ




HEJ KOMPIS
QUN PÎS, BIRA SULALA TE BE, SEGBAV!
MaMoste 91




LI EWRUPA'YÊ QURSÊN QUR'AN XWENDINÊ ROJ BI ROJ ZÊDE DIBIN.


Matkošić '92




MIN 2 SAL LI BULGARÎA XWEND DÎKTORA XWE LI LENÎNGRAD DAM, LI ÇEKOSLAVAKYA BÙM DÎKTOREKANÊ FÎSÌK Û NÛHA LI VIR DIÇIM AMS'Ê Û...
DIKTOREKANÈ BERÊZ! EZ VIRDE WIRDE NIZANIM, TU BERSÎVA ÇAR CARA ÇAR ÇI DIKE WÊ BIDE....






DÎVANA BERÊZ EZ DIXWAZIM
BÊJIM KU MUSEEDA WE HEBE,
EZÊ HERIM TOALETÊ
KONGRA KOMELA
KURDISTAN




ŞEVA BÎRANÎNA YILMAZ GÜNEY
STOCKHOLM 1990.


EVREN JI BO RÎDSÊ
TEDBÎR SITEND




DO
ÜLKÜCÜ
KOMANDOLAR


ÎRO
BÖLGESEL
SAVUNMA BIRLIKLERİ


ÇIMA WEXTA KU EZÊ TE MAGÎ BIKIM, GEREK EZ GUHÊN TE KAŞKIM?
EVÎNA MIN... JI BER KU CARA BERÊ EZ JI CUZDANÊ XWEYÎ PERA BÛM..
MaMoSe




DEWLETA TIRK
ALÎKARÎYA XWE DIDOMÎNE.


JI ME DERBAS BÛYE. XELASKIRINA KURDÎSTAN WÊ BI DESTÊN ZAROKÊN ME BE...
JI XWE HÊVÎ EW IN.
WAYE DÎSA DEST BI POLITÎKAYÊ KIRINE..
BIRA EW KURDÎSTANÊ XELASKIN, EM JÎ DANSA XWÉ BIKIN
Mattosta


KURDO TU AYRILIKÇÎ YÎ!
XELASBÛNA MIN JI DESTÊN VAN KOMUNÎSTÊN TIRKA TUNE YE
KURDO TU ÎŞBÎRLIKÇÎ YÎ!
MaMoSta 91


SA 931:




ÊDÎ MALBATÊN KURDAN JÎ ALÎKARÎ BI ZAROKÊN XWE RE JI BO DIBISTANA WAN DIKIN...!


WAY KERO... HÊ TU NIZANÎ "ELMA" ÇÎYE...
MAMOSTE Û ŞAGIRT
15 SAL ŞUNDE
JI MIN RE BÛYE MAMOSTE!? HÊ NIZANE KELÎME-Î ŞEHADET BÎNE!?
90


ÇI DEMOKRASÎ, ÇI HAL. JIBO ÇENGEK MAL WAN GIRTINE.
1
DE KA WÊ ÇENGEK MAL ÇI BIKE. MA XORTIN ÎHTÎYACA WAN BI PERA HEYE
2
WÊ JI XWE RE KÎLOK DU KÎLO BIFROTANA Û HEWQAS... KA WÊ DU KÎLO MAL ÇI BIKE?
3
QET WELLEH.. DEH Û BÎST JÎ TIŞTEKÎ NAKE. LÊ NE TU DEMOKRASÎ YE. XORTÊN ME DI BIN KONTROLÊ DE NE.
4
KURO WELLEH TONEK MAL JÎ TIŞTEKÎ JI WANA NAKE. LÊ ÇI FEYDE KA DEMOKRASÎYA EM DIBÊJIN.
5
BELÊ KAKACAN BELÊ. KA DEMOKRASÎYA EM DIXWAZIN LI SWÊD JÊRE HÊ PIRR Û PIRR HEYE
6




TUKES JI MIN RE ŞAHIDÎYÊ NAKE!....
XORTIKÊ DELAL GER KU TU JI MIN RE
BIBÎ ŞAHID JIBO BERHEMÊN MIN ÊN
NEÇAPKIRÎ, EZÊ PÊNC HEB ÇUKOLAT
BIDIM TE....



EHLUL MEDENÎ


EKONOMÎYA TIRKÎYÊ LI
RÊYÊN NÛH DIGERE




BIYANÎ LI EWRUPAYÊ
—HINEK ŞOFÊR—


DEMOKRASİ
MaMoSke 92






LI WELAT
LI EWRUPA


KANi
ZAROKÊN
ME
Mahose 92







RIZGARÎ
PÊŞMERGE
TANQ
PKK
OZEL-HERB
TOP
ŞORES
YEKBÛN
BERXWEDAN
PARÊZGER
DEMIREL
TC
WELAT
ŞOREŞ
APO
ESKER
CELAL
PARTI
TSK
BERZANI
GERILA
TÜRKİYE
ŞER
ERNK
BERXWEDAN
ÇEK
SİXUR
TOP
Mamoste 92


GELO KURDĪSTAN
ÇEND PERÇE YE?


HELP

## Mamoste



Di sala 1954'an de li Bismilê hatiye dinê.

Piştî qedandina Dibistana Mamostatiyê, li gelek herêmên Kurdistana bakur mamostatî kiriye. Di wê demê de jiyana gelê xwe bi qelema xwe ya hunerbala, bi xêz û xetên xwe raxistiye ber çavan.

Di pey 12'ê Îlonê re derketiye derveyî welêt.

Ji 1985'an, heta 1986'an bi navê "ÎSOT" kovareke karîkaturan li Swêdê çap kiriye (9 hejmar).

Di piraniya kovar û rojnameyên Kurdî û di hinek kovar û rojnameyên Elmanî û Swêdî de karîkaturên wî çap bûne.

Berhemê wî yê pêşî di 1984'an de bi navê "Dengê Xêzikan" li Swêdê çap bûye, ev berhemê wî yê duyem e.

**Jîna Nû**